

Jinik û Şêr

Ahî Zozanî

Dibêjin jinek li gundekî hebû.

Ew jin herdem bi gilî û gazin û perîşan bû, radîbû û rûdinişt digiriya, kê ji gundiyan wê didît jê re digot çima wisan tu herdem xemgîn û bi kul û derdî? .

Bi keser li wan vedigerand û digot: Ez bextreş im, min xêr ji jiyana xwe nedît!

Rojekê ji rojan, cîranek pêrgî wê hat li ber bîra avê û jê re got: Porkurê rewa di te de nemaye, tu mîna xezalekê bû, me digot wa gula Buharê ji wir hat, ka ew bejin û bala te, çima tu roj bi roj mîna mûmê dadwerivî, ka ji min re bibêje çi bela te ye?

Jinikê bi dilekî şikestî û gewriya wê tije girî - di ber xwe de diponije -lê vegerand:

Ma wê çi bela min be cîranê!



Wey te serê min xwarê, ma min jî mîna bûkan xêr ji mêrê xwe dîtiye, şev û roj xircir e, herdem şerê me ye, diyar e ku ew ji min hez nake!

Dema wê wisan got, cîranê jê re got dermanê te li bal şêx e!

Wê hingê jinikê wek ku jê bawer nekir, hema bilez xwe avêt kirasê wê û jê re got: Ez di bextê te de, ka riya şêx nîşanî min bide!

Cîrana wê jê re got wê şêx devgirêdanekê ji mêrê te re çêke, wê bihêle mêrê te bibe mîna hunguliskekê di tiliyên te de.

nema Jinikê da dû cîrana xwe, dibêje ez di bextê te de ka navê şêx bide min?

Cîrana wê got ji xwe re bipirse ji hinan tê bi ser riya wî vebî!

Vêca jinik dibe wek miriyê ku nuh serê wî li kêvir dikeve, li xwe hay hat û bû bi xwe re diaxive, dibêje gerek ez jî li bextê xwe bipirsim, divê zû xwe bighînim vî şêxî, çûna bal şêx jê re dibe derdek, dizane razê. Radibe derdikeve, ji malê diçe ,ji gundiyan

dipirse kî mala şêx nas dike?

Xelk nizanin çi mesela wê ye, yek ji gundiyan jê re dibêje xanim mala şêx, li filan gundî ye! Jinik jî bi kêf jê re dibêje spas lawo de here Xwedê miradê te bi cih bîne.

Jinik diçe mala şêx, dema derbas dibe, xwe davêje dawa şêx û digrî, jê re dibêje şêxê min ez di bextê te û ûcaxên te de bim, tê bihêle mêrê min ji min hez bike!

Rebenê şêx istexfariya xwe tîne, çiqasî jê re dibêje ez nikarim keça min here Xwedê we bi hev şêrîn bike, jinik hey digrî û doza devgirêdanekê dike da ku mêrê wê jê hez bike.

Ew nizane ku ev şêx ji Xwedê ditirse û baweriya wî bi van hawa nayê!

Lê şêx xelasa xwe ji destên jinikê nabîne, ew jî şêxekî pir belengaz e.

Ji bo ku wê ji ser riwê xwe bide alî, jê re dibêje keça min îşê te pir zahmet e gereke tu porekî ji şêrekî ji min re bînî ta ku ez karibin miradê te bi cih bînin!

Jinik ji kêfa direve derve di hayê wê de wisan hêsan e porê şêr bi dest bixîne.

Dema diçe derve şêx derî digre dibêje here Xwedê riya rast bide ber te.

Jinik bi rê de li xwe hay hat, heylo ka wê ji kû porê şêr peyda bike û kî diwêre nêzîkî şêr bibe. Dîsan riwê jinikê zer dibe, xemgîn dibe dest bi girî dike.

Pîrejinek ji wî alî de bal wê de tê, dilê wê xweş dike wê haş dike, jê dipirse: Keçikê çi bela te ye?

Ew jî derdê xwe jê re dirêse û çîroka xwe bi dawî kir û got pêdiviya wê bi porekî ji porên şêr heye û nizane wê çawa peyda bike.

Pîrê jê re got keça min rabe negrî, li wê daristanê şêrek heye, here ji xwe re porekî bîne.

Jinik dibêje şêr wê min bixwe, ez newêrim!

Pîr jê re dibêje gêjê here, lê nêzîkî wî nebe, her roj jê re hêteke bêrx bibe **D.R(10)**